Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî 10

Tevgera Kurd di serdema nuh û niha de

Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û
Akadimiya Zanistîya Ermeniya Sovyêtê

Institut kurde de Paris

Werger Dr. M.S. Cuma

8 9

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Berlin, di 17. 6. 1999 de

Kurtîya jîyana min di nava çend rêz û dêran de

Ez di dawîya gulana sala 1937 de li gundê Kêstek de li Herêma Cezîrê de li Kurdistana Surî de ji malbata Başokê Yezîdîyî Musulman de hatime bizayîn; jiber ku fermana Bav û kalên min li ser destên Selteneta Osmanî de der sedsalê nozdehan de li Şingalê de hate birakirin û bi darê zorê ve gumgume bi destên me ve dane bihilgirtin.

Min xwendina xweyî dibustanê li bajarê Qamişlo û Şamê de ji sala 1946 tanî sala 1959 de di nava hin dibustanên Suryanî de date bidawîkirin.

Di pêşî de di payîza sala 1959 de min li bajarê Şamê de di zanistgeha wê de di berê felsefê de date bixwendin.

Di pişt re di buhara sala 1960 de li Elmanya Fêderalî de li bajarê Monîx de di zanistgeha wê de di berê zanistîyên dewletê de tanî sala 1963 de date bixwendin.

Di payîza sala 1963 de bi saya Partîya Demokratî Kurdistan ve xwendin li Elmanya Demokratî de bi destên min û neh Hevalên dinî Partî ve hate bikevtin û min li Berlina Rojhilat de di Kolêca Aburî de aburîya siyasî date bixwendin.

Di tîrmeha sala 1967 de min têde Diplom di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin û herwehajî têde di reşmeha sala 1972 de min Doktora di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin.

Ji sala 1972 - 1975 de min di warê wergerandinê de didate bikarkirin.

Ji sala 1975 tanî sala 1992 min li zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa aburîya siyasî de bi

Institut Kurde de Paris

gişti ve û di mêjûwa aburîya siyasîya Dewletên paşkevtî de bi taybetî ve didate bikarkirin.

Ji sala 1953 de min xwe bi zimanê meyî şêrîn û perest ve didate bimijûlkirin û wî û herwehajî mêjûwa me tevaya bala min bi ser xwe ve didatin birakişandin. Bi xewna zarotîya min ve dihate biderkevtin, ku ez di warê wî û herwehajî mêjûwa me de bidim bikarkirin û wan bidim bipêşvexistin, da ku miletê Kurd ji sedsalên navî û bendîtîyê de bête birizgarîkirin û bi serxwebûnê ve di nava Kurdistanê de bête bitackirin; jibervêjî ve ez ji bona xwendekarîyê ji bona Ewropa hatim biçûyîn.

Cîhanbînîya min di têgihiştina diyalêktîka jînê de li ser felsefa Zerdeştî, Aristo, Xanî, Hegel û Marx de têtе bibingehkirin û têgihiştina min di çarekirina pirsa kurd de û pêkanîna Dewleteke Milîyî ser bi xwe ve di nava Kurdistanê de li ser rêbazê Barzanî û felsefa Xanî de têtе bicî û biwarkirin.

Ji sala 1953 de û hêjî ez bi Endamê Partî ve têtim biderkevtin û her û her ez bi jêhatî ve di nava rêzên wê de bi mîna Endamekî ve didim bikarkirin.

Di nava salên 1979 tanî sala 1993 de bi Endamê Komitîya Nawendî û Endamê Mekteba Siyasî ve dihatim biderkevtin.

Di sala 1996 de ez bi Nîşana Barzanî ve hatim bixelatkirin û herwehajî bi Rawêjkarê Siyasî ve ji bona Mesud Barzanî hatim bidestnîşankirin.

Ji sala 1964 de min jinek Elmanî dayite bianîn û lawekî me bi navê Ciwan ve têtе bidîtin, yê ku ew bi yekekî ve ji Zanistvanên Gencên Elmanî ve di Zanistîya Elektironik de têtę biderkevtin.

Min di jîna xwe de ji xwe re bi zimanê Erebî, Ingilîzî, Suryanî, Farisî, Elmanî û Rusî ve dayête bixwendin; belam min Suryanî û Rusî dane bijibîrakirin.

Institut Kurde de Paris

Li vêderê de ez hinek ji karên xwe li ber destên Xwendevanên giramî de didim bidanîn û ew jî evin; tevî ku armanca min di jînê de têtе biderkevtin, ku ez sed nivîstan bi Kurdî ve bi zaravayê kurmancî ve ji bona nivîstxana Kurdî bidin binivîsandin:

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1931-1958
Mesud Barzanî

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1958 - 1961
Mesud Barzanî

Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Mohemed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet Û Mîrneşînîyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De
- Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd Û Kurdistan -
Mohemed Emîn Zeki Beg

Pirsiyarîya Kurd
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan
(Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer)
-Belavoka Pêncem -
Dr. Bilêc Şêrkoh
Kurd
Rûnkirin û Dîtin
Kurd Nevîyên Mîdîyan
V. F. Mînoriskî

Institut Kurde de Paris

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de
Profisor A. Hesretyan

Der Barê Sitratîcîya Siyasî û Sipahî ya
Tevgera Welatîyî Kurd
-Temaşekirinek ji bona Mêj û Neha, herwehajî yekeke din ji bona Ayinjî de-
Ismet Şerîf Wanlî

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şêweyê wê, Pêşkevtina wêna, Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û Dîroknivîsandina Rojhilatê de
Doktor Ismet Şerîf Wanlî

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Zanistîya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de

Mîr
Nikolo Mikavili

Peymana Civakî
Jean-Jacques Rousseau

Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê
Friedrich Engels

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan
Friedrich Engels

Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de
Lenin

Institut kurde de Paris

Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê
Lenin

Zîneta Zimanî di nava Heremên Kurdî de
R. I. Tissabolov

Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-Çend bîr û bawerî li ser hin rudanên siyasîyî de ji sala 1956 - 1975 de-
Dr. M. S. Cuma

Herrwehajî min di sala 1966 de namilkeyek di bin nav û nîşana: Li ser tirba Þêro de date bibelavkirin

Herwehajî min Manêsta Partîya komunist ji bal Karl Marx - friedrich Engels de di sala 1975 de ji bona zimanê Kurdî zaravayê kurmancî date biwergerandin û ew di weşanên Ronahî de di sala 1976 de hate biçapkirin.

Herwehajî min di gelaveja sala 1986 de: Sî sal mêjûwa Komela Xwendevên Kurd li Ewropa date binivîsandin. Ew ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di gelavêja sala 1986 de li bajarê Berlina Rojava de hate biçapkirin.

Dr. M.S.Cuma

Institut Kurde de Paris

Naunîşan: Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
Nivîskar : Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Zanistîya Ermeniya Sovyêtê ; Mosko
Werger : Dr. M.S. Cuma

Çapa yekem : Kurdî - Kurdmancî - 1999
Çapxana : Rewşenbirî - Hewlêr - Kurdistan
Dane : 1000
Leyawt: Govend M.H. - Berig: Serdem
Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (104) li sala 1999

Institut Kurde de Paris

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî (10)

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de

Institut kurde de Paris

Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Zanistîya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de Civata Serpereştîya Derxistinê:

M. A. Hesretyan (Serpereştîyê Berpirsiyar)
M. C. Lazerêv
S. X. Mugoyan

Çapxana Nauka, ya beşê Bingehê Wêjeya Rojhilat.

Werger Dr. M. S. Cuma

Institut kurde de Paris

Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (104) li sala 1999

Çap: Çapxana Rewşenbirî - Hewlêr - Kurdistan

Navrok

Institut kurde de Paris

Pêşgotin 3

Derîyê Yekem 8
Perçê Yekem 8
Raperînên Kurdan di pêşîya sedsalê nozdehan de 8
Xebat ji bona Serxwebûna Kurdistana Jêrî di salên 1820/1840 de 14
Tevgera Kurd di qonaxa Cenga Qerim de di pêncîyên sedsalê nozdehan de 27
Tevgera Kurd di şêst û heştîyên sedsalê nozdehan de 35
Tevgera Kurd di bin Rêberîya Ubeydulah de 45

Institut kurde de Paris

Pêşgotin

Institut kurde de Paris

Kurd yek ji kevtirîn Miletên rojhilata nêzîk û navînî tête biderkevtin. Kurdan şopên pir diyar di mêjûwa heremê de dane bihiştin; herwehajî pêrejî bigir ew di tevaya bûyînên derbasbûyî de hatine bibeşdarîkirin. Jiber hebûna ferhenga wanî bi serê xwe ve Kurd bi rengekî mezin ve ji bona pêşvexistina remanê di navbera Miletên Turk, Iranî û Welatên Ereban de hatine bibeşdarîkirin.

Di serdema meyî niha de pirsiyarîya Kurd ji xwe re giringbûneke gewretir dayite biwergirtin. Cewhera vê kêşê ji alîyekî di berzbûna şiyarbûna Milîyî Kurdan de di xebata wanî qehremanîyî nebez de ji bona rizgarîkirina wanî welatî de tête biwênekirin û ji alîyê din de di dujminatîya Rêjimên Serdarên Kurdistanê de tête biderkevtin, yên ku wan Kurdistan di navbera xwe de dane veparvekirin, yên ku ew bi mafên Milî Miletê Kurd ve pê nayêtin birûniştin.

Di serdema meyî neha de -li gora serjimarê de- di

rojhilata nêzîk de bigir 20. melyon Kurd têtin bijîyandin. Ji wan:

10. milyon li Turkîyê de
6. milyon li Iranê de
3. milyon li Iraqê de
1. milyon li Suryê de

Pirsiyarîya kurd bes tenê li ser rewş û zînetên Dewletên rojhilata nêzîk û navîn de dide bikêrkirin, lêbelêjî herwehajî ew li ser pêwendîyên di navbera wan Dewletan de bi xwe jî ve dide bikêrkirin, herwehajî pêrejî ew li ser ramyarîya Dewletên rojavayî jî de di vê heremê de dide bikêrkirin, yên ku ew her û her didin bikarkirin, da ku ew tevgera kurdan ji bona armancên xweyî impiryalî bidin bikaranîn, pêrejî ew berê biyekkirina hêzên Kurdan ji bona xebata wanî dadwerîyî rizgarîkirinê didin bikelemkirin.

Li mêjûwa Kurdî kevnar û herwehajî ya di sedsalên navînê de jî bi rengekî pir kêm ve lê hatîye bigerandin, evayajî bi xwe jî ve bi pileyekî berz ve li ser lêgerandina mêjûwa Kurd de di demên tên de dide bikêrkirin. Lêbelê di dema meyî niha de divên lêgerandinên pir bi nerx ve ji bona rengên taybetî û giştî ji pêşveçûna pêwendîyên Civakî û Abûrî di Kurdistanê de bêtin bixwendekarîkirin. Jimarên pir lêgerandinan li ser mêjûwa Kurd de di serdema nuh û niha de bi rengekî baştir ve li nik me, li Yekitîya Sovyêtê de û herwehajî li derve de hatine biçapkirin. Lêbelê beşekî mezin ji van karên dawî tevî

Institut Kurde de Paris

lênerîna wanî yekalî jî li ser mêjûwa Miletê Kurd de û herwehajî pêrejî encamkirineke zanistîyî rast li ser pêkhatina Civakî, Siyasî û Rehî de li Kurdistanê de ne hatîye bikirin, hêjîbêtir ew lêgerandinên hanê bi destkarîyên gewre ve di rastîyê û bûyînên mêjûwê de bi diyar ve têtin binîşankirin. Ev encamkrinên hanê ji siyaseta Mîrîyî van Dewletên heremê têtin biderkevtin, yên ku ew hebûna serbixweyî Milîyî Kurd û pêwistîya bi pêrûniştina mafeyên wanî Milî didin binayînîkirin.

Hin ji karên Nivîskarên Ewropa Rojava li ser mêjûwa serdema nuh û nemaze dema niha de bêtir hatine birawestandin; tevlivêjî de ew ligel daxwazên zanistîya mêjûwî nuh de nayêtin bilihevkirin. Tevî ku ew bi rengekî bazirganî jî ve hatine bidanîn, her û her ew piştgirtina rawestandina siyasîyî Dewletên Rojavayî di Rojhilata nêzîk û navînê de didin bigirtin, yên ku wan bi diyar ve pir destanên gewre bi serê Gelê Kurd ve dane bianîn.

weha lêgerandinên mêjûwa serdema nuh û nehayî Gelê Kurd hêjî beramberî bi pir kelemên mezin ve têtin bikirin, yên ku ew divêtin ji ber wê bêtin bihilanîn. Jiber vê yekê pêşkeşkirina lêgerandineke giştîyî lihevhatî di mêjûwa Miletê Kurd de di serdema nuh û niha de bi niyazmendîyekê ve ji daxwazên serdema nuh bi xwe ve tête biderkevtin.

Ev lêgerandina zanistîyî berê xebata bi hev re ji Karnasan di berê Kurdî de, yên ku ew di Fêrgeha Rojhilat de didin bikarkirin, ya ku ew bi Akadimîya Zanistîya Yekitîya Komarên Sosyalistîyî Sovyêtê (Y.K.S.S.) ve û bi Fêrgeha Rojhilata Akadimîya Zanistîyî Komara Erminya Sosyalistîyî Sovyêtî ve tête vegirêdan, hîç gûmanekê li ser binerxbûna zanistî û siyasîyî ji vê Nivîsta hanê re nahêle bête bihiştin û ev ne bi lihevhatinekê ve tête biderkevtin,

Institut Kurde de Paris

ku karekî bi vî rengê hanê ve di cara pêşî de ji bal Karnasên Sovyêtê de di warê Kurdan de tête biafirandin. Li Yekitîya Sovyêtê de pir cih têtin bidîtin, yên ku ew di warên Kurd de li ser mêjûwê, wêje, zinistîya ziman û zanistîya rehê de didin bikarkirin. Karnasên Sovyêtî di warên Kurdî de bi beşdarbûneke hêja ve di lêgerandin û lêkolandinên mêjûyî de didin bikarkirin. Heger ku ne ji kar û barên wanî bi nerx ba, dê ev karê di nava destên me de tête bidîtin, dê me ew nikarîba bida bikirin.

Koma Nivîskaran ji bona vê nivîsta hanê tevaya alîyê mêjûwa vê dema lêgerandinê li berxwe de nedane bidanîn; jiber ku berê firehbûna vê lêgerandinê rê pê nade bidan; herwehajî pêrejî berzbûna pileyê zanistîyê ji bona pir alîyan di vî warê hanê de hêjî nihatîye biderkevtin; lêbelê hêjî ew li bende gerandinên tên de çavdêrîyê didin bikirin.

Danervan bi xurtî ve li ser yek deqeke mêjûyî de dane bigêrdan, bi rastî jî ve ew bi xwe ve bi giringtirîn alî ve tête biderkevtin, lêbelêjî hêjîbêtir ew her tiştî dide bidiyarkirin.

Êv lêgerandina hanê şêweyê giştîyî tevgera Kurd dide bieşkerekirin. Ev tevgera Kurd, carcaran ji Rûniştvanên Kurd li Erminya Rojava de, di wan Wilayetan de mîna Siwasê, Erzeromê, Wanê, Bedlîsê, hd. beşek jê bû. Armanca vê lêgerandinê çilobûna pêkhatin û pêşveçûna xebata Kurd ji bona azadîyê û mafeyên demokrasî, herwehajî qonaxên pêkhatîna xebata neştîmanîyî rizgarîkirinê, idyolocîya tevgerê û berên wêyî siyasî, pêrabûnên sazmendî û partîyên siyasî, guhertina pêwendîyên hêzên civakîyî çînî di nava civaka Kurd de, herwehajî wênekirina vê li ser xebatê de ji bona mafeyên milîyî demokrasî tête bidîtin.

Institut kurde de Paris

Ev karê hanê alîkarîya Merov dide bikirin, ku Merov nêrînekê bikaribe li ser xebata qehremanîyî Gelê Kurd de beramberî Serdarîya Bêganê ji bona sexwebûna milî û rizgarîkirinê bide biavêtin, ya ku ew hêjî nihatîye bipayînîkirin.

Nivîskar bi tevaya alîyên xebata azadîya Kurd pê têtin birûniştin, ya ku ew ne ji hemû alîyan de mîna hev hatîye biderxistin, lê ew bihêvîdarîn, ku bi vî rengê jî hanê ve dê ev lêgerandina hanê bi alîkar ve bête biderkevtin, da ku yekek ji kêmanîyên zanistîya Sovyêtî de di warên Kurdî de bête bihilanîn, herwehajî dê ev karê hanê jî mîna bingehekî xurt ji bona lêgerandinên din di tevaya mêjûwa Kurd de bête bidanîn.

Di koma vî karê hanê de (Tevgera Kurd di Serdema Nuh û Niha de) têde têtin bibeşdarîkirin:

M. A. Hesretyan (Beşê Kurdê Turkîyê)
C. C. Celîlî (Beşê I)
O. I. Cigalina (Beşê Kurdê Iranê)
M. C. Lazarêv (Beşê II-III)
S. X. Mugoyan (Beşê Kurdê Iraqê)

Danervanê Navnîşanan A. G. Bagirov
Danervanê Navnivîstan L. A. Acoyêva

Institut Kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Derîyê Yekem

Perçê Yekem

Raperînên Kurdan di pêşîya sedsalê nozdehan de

Institut kurde de Paris

Di destpêkirina sedsalên nozdehan de Kurdistan teyê bigota, ku ew belkî du carî hatîye biperçekirin. Ji alîyê Derve de ew di navbera Şahyarîya Osmanî û Şahînşahîya Iranî de hatibû biparvekirin, yên ku ew ji alîyên xwe jî de ber bi herifandinê ve dihatin birakişandin û ew hêdî hêdî ber bi jêrdestîya abûrî, leşkerî û siyaseta Dewletên Rojavayî û rusya ve dihatin bikevtin. ji alîyê Hundur de ew di navbera Mîrneşînîyên Derebegîyê de dihatin veparvekirin, yên ku ew di pêla sedsalên navînî de hatibûn bipeydakirin û di nava wan de mîna Baban, Bahdînan, Botan, Hekarî û Mîrneşînîyên din dihatin bidîtin. Di nava wan de hergav şêr û ceng dihate bivêkevtin; jiber vê yekê jî ve sînorên di navbera wan de her û her di tengbûn û firehbûnê de dihatin biderkevtin. Tevî ku jî baban, Soran û Bahdînan ji Paşetîya Begdadê jî dihatin bijimartin, lêbelê di rastîya rastîyê de pêwendîyên wan ligel Paşetîya Begdadê de pir bi lawazî ve dihate

biderkevtin; jiber ku Mîrneşînîyên Kurdan bes û bi tenha ve di demên cengê û şer de ji Paşa re hin komên leşker didane bipêşkeşîkirin, herwehajî di navbera demekê û demekê de wan nedidane bijibîrakirin, ku ew diyarîyên bi nerx ve jêre bidin birêkirin û beramberî vanjî ji Berpirsiyarên Kurd pêş û bacên Dewletê nedihatin bisitendin. Serdarîya Derebege di nava wan de bi serê xwe ve dihate biderkevtinb, herwehajî gewrebûna bac û bêşan, rengê danîna wan, rêya komkirina wan li gora kêfa Derebege de dihate bikirin.

Ji dawîya sedsalên heştdehan de Mîrneşînîya baban jiber gewrebûna cihê erdê wêyî sitratîcî mîna girêka pêwendîyê di navbera Patîşahîya Begdadê û Iranê de date bidestpêkirin, da ku ew roleke jêhatî di jîna siyasîyî Patîşahîya Begdadê de bide bibîyarîkirin. Di destpêka sedsalê nozdehan de bajarê Sulêmanîyê bi Navînîya Mîrneşînîya Baban ve hate biderkevtin, ya ku têde di sala 1812 de nêzîka 4 hezar Kes dihatin bipeydakirin û piştî heşt salan 10 hezar Kes têde dihatin bijîyandin. Di dawîya sedsalê heştdehan de Serdarîya baban di encamê pevçûnên hundurû de bi rengekî pir mezin ve hate bilawazkirin. Vê destdirêjîyên Wênerên Şah û Sultan di kar û barên hundurûyî Mîrneşînîyê de date bihêsanîkirin.

Di sala 1803 de Ebdul-Rehman Paşa bi Mîrê baban ve hate bikirin. Ev bi gavên karî ve ji bona xurtkirina Serdarîya xwe û firehkirina erdên Mîrneşînîya xwe pêhate birabûn. Tevî ku gavên bidij ji bal Patîşahê Begdadê jî de Ebdul-Rehman Paşa di demeke kurt de rewşa xweyî hundurû dikarîbû bida bixurtkirin û ew li Hevalbend û Parêzvanên derve ji navbera Mîrneşînên Kurdên Hemsa û Sînordaş, herwehajî li nik Wênerên Şah de li Kermanşah de destên xwe bide bigerandin. Pir bi jîrbûn û hostayî ve

Institut Kurde de Paris

wî nobûna pêwendîyên di navbera Selteneta Osmanî û Şahînşahî Iranî de ji xwe re date bikaranîn û wî di sala 1806 de xwe tev li leşkerê Serdarê Kermansah Mohemed Alî Mîrze de date bikirin, yê ku ew beramberî Fermandarê Begdadê Alî Paşa hate birabûn. Qonaxa hatî ji Serdarîya Ebdul-Rehman Paşa bi şer û cengên li dûhevdû de li ser tuxûbên Mîrneşînîya wî de di navbera hêzên Fermandarên Begdadê û yên Wênerê Şah de tête binîşanîkirin.

Di sala 1810 de bûyînên li Patîşahîya Begdadê de li kara Mirê Kurd de didatin bilîstin, gava ku Serdarê dawîyî Patîşahîyê Kuçûk Sulêman dilbijandina cihêbûnê ji xwe re date biderxistin, ku ev bi hoyê rakirina fermanê ve li ser de hate bikirin. Weha Ebdul-Rehman Paşa kês û nefer ji xwe re date biwergirtin û wî bi 20 hezar Şervanên hêzên Kuçûk Sulêman dane bitarûmarkirin û wî ew date biavêtin.

Di salê tên tanî 1813 de tevî li nobûnên pevçûnan de di navbera Mîrê Kurd û Serdarê nuhî Iraqê Ebdula Paşa de ji alîyekî de û di navbera wî û Wênerê Kermanşah de ji alîyê din de vî Serdarê Kurd bi jîrbûn û jêhatîya xwe ve dikarîbû sînorê Mîrneşînîya Babanî bi rengekî pir mezin ve bide bifirehkirin û Seradrîya xwe bide buxurtkirin.

Di piştî mirina Ebdul-Rehman de di sala 1813 de Lawê wîyî mezin Mahmud Paşa bi Mîrê Baban ve hate bikirin, lêbelê wî nikarîbû li ber Mîrneşînîyê de ji destdirêjîya nava wêyî xweser ji bal Iran û Begda de bida bidan; herwehajî pêrejî salên Serdarîya Mehmud Paşa di pêla jêhatîbûna karên kolonîya Ingilîz de li Iraq û Iranê de dihatin bikevtin.

Di navîna sedsalê nozdehan de Mîrneşînîya Baban hate birûxandin û ew bi carekê ve hate binabûdîkirin. Wisajî Mîrneşînîyên Behdînan û Soran hemsayên Baban reşewan wan jî ji ya Baban ne bi baştir ve dihate

Institut kurde de Paris

biderkevtin.

Mîrneşînîya Behdînan, ya ku ew li jorî Musilê de dihate bikevtin, ji mêj de hatibû bipêkhatin, herwehajî ew jî di nava sînorê Patîşahîya Begdadê de dihate bikevtin. Qesra Mîr li bajarê serekîyî Mîrneşînîyî Emadîyê bû. Weha Diplomasîyê Ingilizîyî Zanevan B. Liyard ew bi "kilîta Kurdistanê" ve didate binavkirin.

Behdîna yekek ji Mîrneşînîyên Kurdan bû, ya ku ew pir him ji alîyê milî ve û himjî ji alîyê oldarîyê ve bi tevlihev ve dihate biderkevtin. Wisa li kêleka Kurdên Musulman de Yezîdîyên Kurd, herwehajî Aşurî, Ermenî, Cihu û Wênerên Gelên din dihatin bijîyandin.

Di bin rewşa cengên hundurûyî no de Behdînan pêrgî sedsalê nozdehan dihate bikirin, di van cengê hanê de bi rengekî jêhatî ve Serdarên Begdadê û Musulman têde dihatin bibeşdarîkirin.

Ji sala 1808 de tanî sala 1825 de Zubêr Paşa li Mîrneşînîyê serdarî dida bikirin, yê ku wî bi jîrbûn û hostetîya xwe ve xwe ji hemû dilbijandinên serdarîyê date bidûrkirin, herwehajî li gora pêrûniştinên Hemdemên Zubêr Paşa de ew him bi jîrbûn û hîşbûnê ve û himjî li geljî de bi sertbûn û çareserkirina dijwarîyan ve dihate binîşankirin.

Piştî mirina Zubêr Paşa Mîrneşînîya Behdînan di zîneteke kevtileftîyî tûj de di navbera Mîran Beg, Seîd Beg, Musa Beg û Ismaîl Beg de xwe didate bidîtin, yên ku wan ji xwe re daxwaza mafeyî navê Mîr didane bidaxwazîkirin. Belam seid Beg piştî hevalbendîtîya Ismaîl Beg jêre ew hate biserkevtin û ew bi Serdarê bi serêxwe ve hate bikirin.

Siwarkirina milî û ferhengîyî Miletê Kurd di Mîrneşînîya Botan de, ya ku ew li rojavayî Behdînan û

Institut kurde de Paris

Hekarê de dihate bikevtin, bêtir bi lehevkirî ve dihate biderkevtin û bajarê Cezîrê bi navînîya Mîrneşînîyê ve dihate biderkevtin, herwehajî li Mîrneşînîya Botan de Malbata Mîrên Kurdan ji Bavikên Ezîzan didane biserdarîkirin.

Mîrneşînî di navbera sedsalên heftdehan û heştdehan de di zîneta herifandinê de dihate bijîyandin û ew di destpêkirina sedsalê nozdehan de ji nûve careke din hate bivejandin; evjî gava ku di sala 1821 de Bedirxan Beg serdarîya Mîrneşînîyê bi destên xwe ve date bixistin.

Erdên Mîrneşînîya Hekarê bi kohustanî ve dihate vederkevtin û ew li jêrî Gola Wanê û li bilindaya kanîyên Çemê Zabê Mezin de dihate bikevtin, ji jorî rojava hindamên Mîrneşînîya Wan û Xosab ew didan bisînorkirin. Bajarê Colamerg bi navînîya Mîrneşînîyê ve dihate biderkevtin. Herwehajî di nava bajêr de Keleheke pir sengîn dihate didîtin, wisajî di nava bajêr de jî pir mizgeft, dibustan û avanîyên giştîyên din dihatin bipeydakirin.

Mîrên Kurdên Hekarê ji Bavikê Şambo dihatin vedakevtin. Xelkên Kurd di Mîrneşînîyê de ji Yekitîyeke Êşirîyî mezin dihatin bipêkhatin, yên ku ew ji komên serbixwe ve dihatin bidurustkirin, herwehajî di nava wan de jî ji bona Miletên din jî cih dihate peydakirin; jiber di hin deverên Mîrneşînîyê de Dapersîn, Tiyarî, Tobî û hinên din dihatin bijîyandin. Xelk di koka xwe de ji Aşurî û Ermenîyan dihatin bidakevtin.

Serdarîya Mîrên Hekarîyan di destpêkirina sedsalê nozdehan de bi diyarî ve xurttir û firehtir dihate biderkevtin; jiber ku hêzên leşkerê Turkî di bin Rêberîya Wan Paşa de di nîvê duwem de ji sedsalê heştdehan de bi

Institut Kurde de Paris

pir hêrîşên leşkerî ve dijî hin ji Serdarên Kurdên jorî Hekarê hate birabûn. Ji vê rewş û zîneta hanê Mîrê Hekarê kês ji xwe re date biwergirtin, ku ew wan Eşîran jêrdestî serdarîya xwe bide bikirin. Di destpêkirina sedsalê nozdehan de tevaya heremên Moksa -Moksê- bi serdarîya Mîrê Hekarê ve hatin vegirêdan. Herwehajî li gora hin ji kanîyan de Mîrê Hekarê di pêşîya sedsalê nozdehan de dikarîbû hêzeke çekdarîyî zor baş ji çil hezar Şervanan bide bipêkanîn.

Lêbelê Serdarên Iranê her û her dixwestin, ku ew desthilatîya xwe li ser Serdarên Hekarê de bidin bizalkirin, evaya li nik Dundê Şahê Iranê Ebas Mîrzayê Serdarê Ezirbêcanê de pir bi rengekî eşkere ve hate bidiyarkirin, gava ku wîna Eşîra Kurdîyî mezin Bîlim bi rexê xwe ve date bikişandin û wî ew bi dijî Mîrê Hekarê ve date birakirin. Piştî vê Mîrê Hekarê Mustefa Paşa bi neçarî ve bi zalbûna Şahê Iranê ve pê hate birûniştin.

Lêbelê Mîrneşînîya Soran li rojhilatî Behdînan û jorî Mîrneşînîya Hekarê de dihate vekevtin û ew di sala 1787 de Rewanduz bi navînîya Soran ve hate bikirin.

Di vê Mîrneşinîya hanê de salên pêşî ji sedsalê nozdehan de bi cengên hundurû ve dihatin binîşankirin, nemaze gava ku hinan ji Xwestvanên Serdarîyê daxwaza yarmetîyê ji Mîrê baban dane bikirin û hinên din daxwaza alîkarîyê ji Mîrê Behdînan dane bikirin.

Weha bi vî rengê hanê ve Kurdistan tanî sîyê sedsalê nozdehan di nava Zemîndarên derebegîyî biçûk de dihate biperçekirin, ya ku têde şer û ceng li ser desthilatîyê de di nava Serdaran de dihatin bivêkevtin. Weha ew alîyên westayî qels hêdî hêdî dihatin bijibîrkin. Di vê pêla hanê de desthilatîya Istenbolê li ser Kurdan de bes bi nav ve dihate biderkevtin; lêbelê kêra Serdarên Begdadê li ser

Institut Kurde de Paris

wan de dihate bibêtirkirin: ew jî bi bikaranîna siyaseta Osmanîyî kevin ve di destdirêjîkirinê de, di vêxistina gelacîyê de û di gûrkirina berberîyê de di nava Derebegan de bi armanca wergirtina desthilatîyê bi carekê ve di nava Mîrneşînîyan de û destdirêjîkirina di nava kar û barên wanî hundurû de dihate biderkevtin. Li ser encamê vê yekê de hêzên yekgirtîyî xurtî berêyî Mîrên Soran û Baban hatin biperçekirin. Vê yeka hanê jî guhpêdana Serdarên Mîrên xurtên Soran û Baban ber bi xwe ve date birakişandin; jibervêjî ve wan berê xwe ber bi yekkirina Zemîndarên Kurd ve di Dewleteke Derbegî de di bin desthilatîya xwe de dane bivedan.

Institut Kurde de Paris

Xebat ji bona Serxwebûna
Kurdistana Jêrî di salên 1820/1840

Sinceqên Rewanduz, Kerkuk, Hewlêr, Koyesinceq û Herîrê tev de di Eyala Şehrezorê de dihatin bikevtin, yên ku ew bi Walîyê Begdadê ve dihatin vegirêdan.

Di Sinceqa Rewanduz de bi rengekî bingehî ve Eşîrên Kurdîyî Şîvsorî, Bedsanî û Pewendok dihatin bijîyandin. Lêbelê Eşîra Pewendok cihekî serekî ji xwe re didate biwergirtin û ew ji 12 Bavikan dihate bipêkhatin.

Di salên 1820/1830 de Mîr Mohemedê pir jîr, jêhatî û bi desthilat ve serdarî li Sinceqê de ji bona nava destên xwe date biwergirtin. Hêzeke leşkerî jêre pir bi pêwistî ve dihate biderkevtin, Jiber ku pevçûnên pir tûj di navbera Merevên wî de li ser daxwaza serdarîyê de dihatin bivêkevtin. Jiber vê yeka hanê jî Mîr Mohemed leşkerekî çekdarîyî baş date bipêkanîn û wî di vî babetî de bi merdbûn ve malê, yê ku ew ji bal Bavê wî hatibû

bidestkevtin, didate bixerckirin. Berî hertiştî ew bi xurtbûna Bargehê xwe ve hate birabûn, lê jiber ku dê bedena bajêrî nivketî xwe li ber hêrîşên Dujmin de nedaba bigirtin, wî dest bi avanîya Kelehî ve li ser carê jorî bajêr de date bipêkirin û di piştre ew bi navê Nayic Keleh hate binavkirin. Di vî cihê hanê de bi xwe ve Mîr Mohemed hêzên xwe bi serhev de dane bikomkirin û têde jî wî embarek çek jî date bidanîn. Pêrejî wî ji bona parastina bajarê Rewanduz ji hêrîşên Dujmin bedeneke dinî nuh bi sê dergehên sengîn ji herdu rexên wê ve, yên ku her yek ji wan bi du bircên Dergevanan ve didate biparastin, date biavakirin. Herwehajî di nava bajêr de jî ew bipêrabûnên li berxwedanîyê de hate bipêrabûn û ji giringtirîn van pêrabûnên hanê danîna kenalekê têtebiderkevtin, ya ku wê bajar ji serê wî tanî dawîya wîna didata bibirîn. Mîr pêwendîyên xwe ligel erdên dorhêla bajêr de didate biparastin, ku wî di her qonaxeke nîşankirî de bingehên asayişê, asûdebûnê û şerkirina hemû rengên talanîyê û şêlandinê date bidanîn.

Dîwana wîna mîna desthilatîyeke serpereştîyê li Rewanduzê de bi kar û barên xwe ve date bidestpêkirin û ew bi hemû erkên desthilatîya cihî ve dihate bipêrabûn. Mêjûvanê Mîr Mohemed Okeya date binivîsandin: "Hemû derîyên dîwanê li beramberî Serlêdanan vekirîbûn û guhdarî li daxwaz û gilîyên wan de dihate bikirin". Dibe, ku Mîr Mohemed bi wan gavan hate birabûn; jiber ku berberîya wîyî tûj ligel Biran û Apên wî de dihate bikirin, yê ku wan cihê wî didane bihejandin. Di nava Dujminên Mîr Mohemed de nemaze Mamên wî Teymur Xan û Yehya Beg dihatin bixuyanîkirin, yên ku pir bi giranî ve ji bona zorbirina wan li ser wî de hate birawestandin.

Piştî ku wî pevçûna xwe ligel Merevên xwe de date

Institut Kurde de Paris

bidawîkirin. Wî tevaya mal û samanên wan ji bona jêr destên xwe dane bixistin û wî ji bona vegirtina heremên dorhêla xwe date bidestpêkirin, yên ku ew li jêr serdarîya Serdarên Kurdên serbixwe ve dihatin bidîtin. Lêdana pêşî dijî Serdarê Biradost Selîm Xan û Lawê wî bû, yê ku wî ew di gelavêj sala 1815 de li nêzîka keleha Xarkêl de dane bidîlkirin. Di piştî vê re wî berê xwe ber bi Serdarê duwemî Biradost Hesen Beg ve date bivedan, di piştî şerekî giran ve Hesen Beg bi neçarî bezadnê ve hate bikirin û di 12 keçîrînka sala 1815 de hêzên Mîr Mohemed keleha Biradostiyî serekî Saraw date bivegirtin.

Pîştî Biradost Mîr Mohemed hêzên xweyî serekî dijî Zemîndarên heremên mergever û Şino date biraserîkirin. Di rêya xwe de ji bona Mergeverê wî Eşîra Lêtan bê liberxwedanî ji bona jêr destên xwe date bixistin û di pişt re jî wî keleha Nalos date bivegirtin. Di wê salê jî de wî Eşîra Zêbarî jî bi jêr destên xwe ve date bixistin.

Mîr Mohemed bi rengekî pir mezin ve guh bi xurtkirina hêzên liberxwedana mulkên xwe pê didate bidan. Hosteyên sazkirina çekan û Hosteyên bi nav û bang ve ji bona Rewanduz didatin bianîn û têde wî karxanên çekên birîndarkirinê, agirî û cebilxane didate biavakirin. Pêrejî ji nûve wî hêzên xwe dane birêxistin, ku jimara wan ji panzdeh hezarî hate bitêperbûn, yên ku ew bi çek û bergên baş ve hatibûn bi,amadekirin. Herwehajî cil û bergên Peyan û Siwaran ji hev bicudabûn û Encumeneke ji pênc Kesan serpereştîya hêzan didane bikirin. Pêvekirina heremên nuh bi Mîrneşînîya Mîr Mohemed ve ew bi hin pêrabûnên guhertinên ve li ser serpereştîya civakî date bineçarîkirin. Civatek ji şeş Kesan di bin navê "Serdarî" de ji bona serpereştîkirina dam u destgehan û herwehajî ji bona sermiyanîkirina li ser avanîkirina burcan, cihokan,

Institut Kurde de Paris

piran, pirsiyarîyên bazirganîyê û hinên din de wî date bipêkanîn.

Da ku Mîr Mohemed serwxebûna xweyî bi yekcarî ve ji Selteneta Osmanî bide binîşankirin, wî pûl ji zêr, zîv û tunc dane bidurustkirin. Li ser rûwê yekemî pûl de "Al-Emîr Mensur Mohemed Beg" hatîye bi neqişandin û li ser rûwê duwemî pûl de "Duribe fi Rewaduz" -li Rewanduzê de hatîye bilêdan-. Yekek ji giringtirîn pêrabûnên Mîr Mohemed danîna civata Zanevan û Hozanan ji bona danîna qanûnan dihate biderkevtin. Herwehajî Mêjûvan ji bona nivîsandina mêjûwa Mîrîyî hatin bitirxankirin û vekirina cuhên avdanê û pêkanîna piran pir hatin bipêşvekevtin. Yekek ji gewretirîn karên Mîr di warê avanîyê de di avakirina wîna de ji bona wargehê Mîr Serxanî dihate biderkevtin.

Mîr Mohemed guhpêdaneke zor giring ji bona serpereştîya civakê pê dida bidan, di her bajar û gundekî mezin de serpereştîyeke bi taybetî ve ji bal Mîr dihate binîşankirin û ji bona bi rêk û pêkkirina jîna abûrî ve bi tundî ve şerê pêrabûnên talanîyê û dizîyê didate bikirin.

Mîr Mohemed di sala 1818 de xwe nala "Al-Emîr Mensur" azad ji Serdar date bidazanîn. Di palpêdana xwe de bi rengekî bingehî ve li ser hêzên xweyî Kurdîyî nuh de bi rêxistinî ve bi vedana desthilatîya xwe li ser heremên din ji Kurdistanê date bidestpêkirin, ne bes bi tenha ve wî zor didate bikaranîn, lêbelêjî wehajî wî hajkirin didate bikaranîn. Weha wî heremên Herîr û Xoşnav bi aşîtî ve dikarîbû bida biwergirtin.

Di destpêka salên sîyî de desthilatîya Mîr Mohemed heremên fireh ji Musilê tanî sînorên Iranê didate bibergirtin. Piştî ku wî deshilatîya xwe di heremên Kurdî de di navbera Selteneta Osmanî de date bixurtkirin, Mîr

Institut Kurde de Paris

Mohemed bi pêvekirina heremên Kurdî li Iranê de bi erdên xwe ve lê date biremankirin. Wî ji rewş û zîneta heyî de kês ji xwe re date biwergirtin; jiber piştî peymana Turkumanîya Aşîtî di navbera Rusya û Iranê de tevaya guhpêdana bi carekê ve beramberî bi zîneta tevlihev ve di Rojhilatî Welêt de dihate bipêkirin.

Hêzên Mîr Mohemed di bin Rêberîya Murad Beg de bi çûna nava Laxîcan û heremên dagirtî bi Kurdên Mukriyanî ve date bidestpêkirin, bêyî beramberîya wan bi hêzeke liberxwedanîyê ve bête birûkirin, ku ew bi cihê peyivandinê ve bête biderkevtin. Herwehajî ji bona xurtkirina paşîya heremên vegirtî Mîr Mohemed bi avanîya kelehan û nuhkirina avanîyên liberxwedanên kevnî nîv herifandî ve date bidestpêkirin. Lêbelê hêzên Iranîyî nardî ji bona beramberkirina Kurdan ew li nêzîka gundê Şah Mehmud tuşî revê bûn.

Piştî girêdana aşîtîyê ligel Fermandarê Misrê Mohemed Alî di sala 1833 de Sultanê Turkî leşkerekî mezin di bin Rêberîya Walîyê Sîwasê Reşîd Paşa de ji bona nabûdkirina bi carekê ve ji Cihêvanên Kurdan date birêxistin. Di havîna sala 1834 de leşkerê ji çil hezar Serbaz ve bi birina hêrîşê ve li ser heremên Kurdîyî Iraqê de ji alîyê bakur de date bidestpêkirin.

Lêbelê livandina hêzên Turkî di nava Kurdistanê de û tanî Rewanduz ji bona reşîd Paşa çend mehan date bidirêjîkirin, herwehajî hatina zivistanê bi ser ve livandina wîna di qûlbûna welêt de date birawestandin û ew hate bineçarîkirin, ku ew leşkerên xwe di mehên zivistanê de li nava bajaran de bide bibelavkirin û jiber giringbûna vê hêrîşê jî Sultan ji bona Serdarê Begdadê û Musilê jî ferman date biderxistin, da ku ew xwe tev li hêzên Reşîd Paşa de bidin bikirin.

Institut Kurde de Paris

Lêbelê amadekirina hêrîşên Turkîyî givaştî tanî buhara sala 1835 de bi derengî ve hate vekevtin, belam piştî bisergirtina li ser hindama Botan de hêzên Turkî bi ber Rewanduz ve. û di pişt re jî ber bi Akra ve hatin vekevtin. Akra bi sê mehan ve bi mêrxasî ve li ber xwe de date bidan. Herwehajî di sala 1836 de Iranê jî dijî Serdarê Rewanduzî Kurd hate birawestandin. Di wê demê de tevaya hêzan xwe ber bi Rewanduz ve didatin bilivandin; lêbelê Mîr Mohemed dor û berên bajêr date bixurtkirin û wî xwe ji bona liberxwedanê didate bikarxistin. Li nêzîka heremên Herîrê şerên giran datin bivêkevtin. Leşkerê Kurd bi çil hezar Serbaz ve di bin Rêberîya Ahmed Begê birayê Mîr de beramberî leşkerê Turk bi şer ve hate bikevtin û di bin givaştinên hêzên Kurd de Dujmin duçarî xwe vekişandinê bû.

Piştî vê yekê Reşîd Paşa bi xapandinê ve date bidestpêkirin. Wî ji mîr re nameyek date birêkirin, ku ew têde dibêje: ew berê xwe jê re nala berê xwe ji bona "Musulmanekî rasteqîne" dide bivekirin û ew ji bona wî dide bibangkirin, da ku bes bêtir xwîna Musulmanan bête birijandin. Weha vê banga hanê li ser hin ji Mele û Olperestên dor û berên Mîr de date bikêrkirin. Mîr Mohemed tevaya pêşnihadên ji bona pêrabûnên gift û gokirinan dane vegerandin. Lêbelê bêbextîyê hin ji rêçên Rewanduzê dane vekirin û di dawîya gelavêja sala 1836 de Mîr Mohemed duçarî bi dîlbûnê ve hate bikirin; jiber ne avê û nejî xwarinê nema bêtir têra hemû hêzan dida bikirin. Keleh ji bona talanîyê hate biberdan, belam Mîr Mohemedê dîl ji bona Istenbolê hate birêkirin û ew bi lez ve bi fermanekê ve ji bal Sultan Mohemedê Duwem de hate bikuştin. Di encamkirinê de Mîrneşînîya Rewanduzê hate biherifandin û Dûndên Mîr Mohemed li Turkan de ji xwe re li alîkarîyê

Enstîtuya Kurdê de Parîs

de dihatin bigerandin.

Hêzên Turkî li nik vegirtina bajarê rewanduzê de bi tenha ve nihatin birawestandin, lêbelê wan desthilatîya xwe bi ser tevaya heremên mayî ji mîrneşînîyê ve dane vedandin. Bi dirêjbûna sê mehan li dûhev de Xelkên bêguneh hatin biazardan. Li gora amareke texmînkirî de deh hezar Kurd hatin bikuştin; herwehajî pêrejî pir gund hatin bitalankirin û bisûtandin.

Wehajî ziyanên Turkan jî pir gewre ve dihatin biderkevtin. Weha bapêş û halan jî leşkerê Turk didatin binirnirandin; bes û bi tenha ve di dorlêgirtina keleheke Kurd de nêzîka çar hezar Serbazên Turk hatin bimirin. Di befibara sala 1837 de Reşîd Paşa li bajarê Diyarbekirê de piştî vegirtina wîyî mirinareş -kolêra- ew pê hate bimirin.

Cihê Reşîd Paşa Hafiz Paşa date biwergirtin û di havîna sala 1837 de ji nuve bi şerên leşkerî beramberî Kurdan ve date bidestpêkirin. Tevî bi kuştîna giştîyî xelkê jî ve wî pir ji Kurdan jî ji bona cihên din dane bisorgonkorin.

Hêrîşa Hafiz Paşa li ser Kurdistanê de bi hoyê pevçûna nuh ve di navbera Serdarê Misrê Mohemed Alî û Turkan de hate birawestandin. Hêzên Hafiz Paşa ji Kurdistanê hatin vekişandin û ew di meha axlêva sala 1838 de li nêzîka Nisêbînê de li ser destên Misriyan de hatin bitarûmarkirin. Pêvçûnan ji nuve di nava Xelkên Kurd de datin bidestpêkirin.

Qonaxa pêşîyî "vegirtina" Kurdistanê di sala 1839 de hate bipayînîkirin, ya ku ew nala qonaxeke zordrîyî dirindî beramberî liberxwedana Gelêrî tête vedanîn. Rêya pêdecûnê ji bal Talankerên Turk de bi şûr û agir ve dihate veqelişandin. Serpereştîya Turkan li welêt de sitemkarî didate bikirin û Welat di pir hereman de date biçirandin. Ji

Institut kurde de Paris

dêlva Sermiyandarîya Bavî, Valmiryar dide binivisandin, ya ku ew li serên qafên çiyayên welêt de hate biderkevtin û hate bibelavbûn. Zodarên Hovber ji Istenbolê careke din hatin vegerandin, da ku ew bi leztirîn dem û bi hêsantirîn rê ve ji bona nava destên xwe wan bertîlanbidin bivegerandin, yên ku wan ew ji bona bidestxistina cihên xwe dabûn bidan".

